Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 177
19'ê Şibat 2012
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

- Peyama sersaxiya PDK Îranê bi hinceta wefata Nivîskarê Kurd Dr. Îbrahîm Yûnisî R: 2

- Dayîka 3 şehîdên riya rizgariya Kurdistanê li Urmiyê koça dawiyê kir R: 2


-Terorîzma Rejîma Komara îslamî çalaktir bûye R: 7

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

***Komîsyona Teşkîlat a PDK Îranê bi nêzîkbûna ji maşkanêya binavê hilbijartina meclisa 9'an li Îranê de daxuyaniyek weşaand ku têde îşare bi rol û erkê xelkê bi giştî û endam û alîgirên partiyê bi taybetî li vê dema hesas û dijwar de dike ku rejîm têde çeqiye û dixwaze bi birêvebirina vê maşkanêyê jestek demokratîk ji xwe nîşand bide. Lewma daxwaz dike ku ji riyên cur bi cur ve di rastaya baykota çalakane a vê meşkanêyê de gavan bawêjin.*** R: 2

## Astengiyên demokrasiyê di Îranê de (beşa 2)

R: 3




**Ebdulla Hicab**

## Car din bazerganî kirin bi kerameta mirovan!

R: 5



**Dara Natiq**

## Ehwaz ezmûnek din ya neteweyên Îranê

R: 7



**Aso Salih**

# Wezareta Îtilata Îranê jî kete ber tehrîman




**Saziya navnetewî a veguhestinên bankî (Soyft), ragihand ku bona hevrêtiya li gel hisarên aborî ên cîhanê li dijî Îranê vê serwîsên xwe ji bankên Îranî re bisekinîne. Ev yeke jî sîstema bankî a Îranê di hemû cîhanê de tûşî arîşeyên nû dike.**

Herweha Wezareta Xizînedariya Amerîkayê jî, Wezareta Îtilata Îranê seba piştewanî ji serkut kirina dijberên Esed di Sûriyê û herweha serkut di navxweyî Îranê de tehrîm kir.

Li gor tehrîma han tev heyî û darayî ên Wezareta navhatî ku di Amerîka û di bin çavdêriya Amerîkayê dene dê dest biser de bê girtin, û herweha karbidestên Wezareta Îtilatê êdî nikarin vîzaya Amerîkayê bistînin.

Tehrîma malî û bankiye Îranê, jiyana rojane ya xelkê Îranê xistiye bin bandora xwe û ger wiha bidome tê pêşbînî kirin ku xelkê bi arîşeyên mezintir û metirsîdartir weke nebûniyê berbirû bibin. Rewşek ku heta karbidestên rejîmê (Esedula Eskeroladî) jî înkara wê nakin.

## Sergotar

## Dîplomasiya teror û şulqandinê

**Selîm Zencîrî**

Di heyamê çend rojên derbasbûyî de tîmên terosrîstî ên rejîma Komara Îslamî ku weke dîplomat, karmendên balyozxaneyan, rojnamevan û nûçegihanan dixebitin, ektîvtir bûne û li çend cihên cuda ên cîhanê de kiryarên terorîstî encam dan û kakil û naveroka dijî mirovî a rejîmê nîşanî hemû dunyayê dan.

Lê hevdembûna wan kiryarên terorîstî li gel çend tiştên din li navxweyî welat û pêwendîdar bi pirsa navikî nîşan ji yek tişte. Jana Îzole bûna siyasî û aborî û tesîra dayîna hisarên li ser rejîmê ye. Lewma ketiye dest û lepan û dixwaze ji hemû riyên siyasî, dîplomatîk, gef, desttêwerdan, azirandin, karên terorîstî û neewle kirina cîhanê mifahê bistîne daku bikare paşekişiyê bi rojavayiyan bike û xwe jî ji vê felaketê rizgar bike.

Ji aliyekê ve mizginiya sê pirojeyên navikî û pêşketina li vî warî de didin xelkê. Hewlek ku heya niha çar biryarnameyên cîhanî û nerazîbûna ajansa navnetewî a Vejena navikî li pey re hatiye û carek din nezelalbûna rejîmê li pirojeya navikî û armancên wê ên neaştiyane nîşan dide.

Ji hêlek din ve balyozên welatên Ewropî gazî û gefa qutkirina şandina neftê ji wan dixwe û dixwaze ji neftê weke alav û karta givaşê li dijî wan mifahê bistîne.

Ji hêla din ve şane û tîmên terorîstî ên xwe li seranserê cîhanê de xistiye kar, ku li wan çend rojên derbasbûyî de li çend welatên weke Hind, Gurcistan, Taylend, Azerbaycan û ...de bi serketin û dewsa xwe jî bi cî hiştin.

Ji hêlekî din ve jî amadegiya xwe bo diyalog û dan û standinê nîşan didin û dixwazin dîsan siyaseta xapandin û kuştina demê bi armanca kêmkirina givaşan û dirêjkirina temenê xwe bikar bînin.

Ew hewl û kiryarên rejîmê serbarê nîşandana rûçikê rastîn ê rejîmê ku li dijî aştî û azadî û bexteweriya gelane, herweha dide selimandin ku makeya sereke ya terorîzma navnetewî û sebebkarê bingehîn ê şulqandina û neewlekirina dever û cîhanê ye. Bêşik karên han dê dosyeya kirîzafir a rejîma Komara Îslamî kûrtir û civaka cîhanî jî bona çareser kirin û ber bi rû bûna bi vê rejîma bikirîz û kirîzafir re hevgitîtir û gavên wan jî dê bileztir bike.

www.arsivakurdi.org

# Daxuyaniya Komîsyona Teşkîlat a PDKÎ li ser baykota hilbijartinê

***Xelkê azadîxwaz ên Kurdistanê!***
***Endam û alîgirên PDK Îranê!***
***Hevalên têkoşer!***

Her wekî dizanin ku rejîma Komara Îslamî di heyamê 33 salên derbasbûyî de, berdewam birêvebirina maşkaniyên hilbartinên serkomarî, meclis û şêwra şar û gundan bona rewayîdan bi xwe birêve biriye û bi armanca bicoşkirina beşdariya xelkê di hilbijartinan de ji her cure pîlan û fêlekê mifah wergirtiye ku mixabin piştî ceribandin û eşkerebûna bi dehan carî a pîlanên rejîmê, dîsan jî kariye lîstikê di dewreyên din de bi encam bigehîne .

***Hevalên xebatkar!***

Niha ku em nêzîk dibin bi binav hilbijartina meclisa 9'mîn a rejîmê, rejîm di rewşekî herî lawaz û xirab de dijî û dixwaze ku bi mifahstandin ji riyên nerewa û pilanên xwe, xelkê Îranê bîne ser sindûqên dengdanê û carek din meşrûiyetek derewîn û rûyekî ji xwe nîşan bide û dunyayê ji kakila nedemokratîk a xwe biguman bike.

Partiya me li gel piraniya partiyên Kurdistanî û herweha partiyên netewên din ên Îranê û partiyên seranserî, daxwaza baykota hilbijartina nimayişî a rejîmê kiriye. Li cih de ye daxwazê ji we bikin ku ji bo pûçkirina pilan û şikestdana rejîmê di birêvebirina vê maşkanêyê, bi gihandina peyama partiya xwe bo xelkê û hişyarkirina wan derheq pilanên rejîmê, bi micid, hişyarî û haydarî ve çalakiyên xwe dest pê bikin.

Hûn dikarin bi bilavkirina tirakt û postir, nivîsîn li ser dîwaran, şandina sms û bilavkirina şevnameyan, gendeliyên siyasî û aborî ên muhreyên rejîmê ku xwe xwe bo meclisê berbijar kirine, herweha baskirin ji mînakên bêhejmar ji cînayet û binpêkirina mafê mirov di Kurdistanê de, pêşeroja tarî a rejîmê û kêrhatînebûna nûnerên meclisê û tewahiya meclisê, sazî û nawendên girêdayî bi rejîmê, herweha baskirin ji rewşa xirab a civakî weke feqr û hejarî, bêkarî û dehan diyardeyên din eşkere bikin. Rewşa han encama siyasetên şaş û pawanxwazane a desthilatdarên rejîmê ne, hûn dikarin xelkê ji vê rewşê haydar bikin û ji wan daxwaz bikin ku di şanoya hilbijartin a rejîmê de beşdarî nekin û di roja ku rejîmê bixwe wek roja hilbijartinê diyarî kiriye, karbidestên rejîmê li gel sindûqên wan bi tenê bihêlin bona ku rejîm êdî nekare liber çavê cîhanê wêne û jestek rewa ji hikûmeta xwe nîşan bide.

Mijarek din ku dibe kar li ser vê bihê kirin, rikeberiya derewîn e ku rejîm di navbera girûpên mesebî, netewî, eşîretî û ... hwd bi armanca bazargermî û bicoşkirina qada hilbijartinê pêk aniye û bi danîna mohreyên xwe li hember hevdu de, hewl dide xelk bikşîne ser sindûqên dengdanê. Hûn divê bi awayekî micid, rijd û bi hişyariyek tewaw ve vê mijarê ji bo xelkê rohn bikin ku kesên berbijar di rûyekî de ketine rêkeberiyê û hemû muhreyên destnîşankirî û bibawer ên rejîmê ne û ji aliyê şêwra Nobedar ve jî hatine qebûlkirin, ku wusa be nikarin nûnerên rastîn ên xelkê bin, jiber ku ew kes, kesên qazancxwaz û girêdayî bi rejîmê ne û hertim di xizmeta armancên rejîmê de kar dikin.


Mijarek girîng û berbiçava din heye ku hûn divê ji bo xelkê rohn û eşkere bikin, pilan û pogramên îdareyên weke "Teimîn Îctimayî" ji bo kişandina xelkê hejar û feqîr bo ser sindûqên dengdanê ye ku bi dana pereyek kêm û hinek pêdawîstiyên jiyanê bi hinek ji xelkê hejar, dixwazin wan bixapînin. Ev kiryara rejîmê ne tenê hevkarîkirin bi xelkê nayê hesibandin, belkî di rastî de bêhurmetî û sivikatiya bi kesayetî û kerameta mirovî a wan û xelik divê xwe jê biparêzin.

***Hevalên têkoşer!***

Hûn dikarin ji riyên cur bi cur vê peyamê bi xelk rabigihînin, weke mînak ji riya sindoqên postî, nivîsîn li ser dîwar, şandina sms, bilavkirina şevnameyan û bi dehan riyên din ku bixwe dizanin û berê jî we ceribandine yan bi her rê û xelaqiyetek din, ev erkê giran bi encam bigehînin.

***"Ne" bo maşkanêya hilbijartinê,***
***"Belê" bo baykota çalakane***
***Serbilind û serketî bin***

# Peyama sersaxiya PDK Îranê bi hinceta wefata Nivîskarê Kurd Dr. Îbrahîm Yûnisî



Dr. Îbrahîm Yûnisî, nivîskar û wergêrê navdar ê Kurd, piştî çendîn roj berxwedan li hember nexweşiyê, roja 19' Rêbendana îsal de, çû rehmetê.

Dr. Îbrahîm Yûnisî, kurê "Silêman Beg" û neviyê "Yûnis xan", di sala 1305'an a Rojî de li bajarê Banê ji dayîk bû, wî xwendina destpêkî a xwe di cihê jidayîkbûna xwe dest pê kir û dewreya navendî a xwe di qutabxaneya "Nîzamî" a tehranê domand. Navhatî bi sedema çalakiyên siyasî ên xwe piştî kûdetaya 28'ê Gelawêj a 1328'an de, ji aliyê hêzên rejîma Paşayetiyê ve hate destbiserkirin. Di destpêkê de hukmê îdamê jêre derçû û piştre hukmê wî bi hepsa heta hetayî kêm bû. Navhatî piştî derbaskirina salek li jûra takekesî di girtîgeha "Qesrê qacer" û 7 salên din di zîndana giştî a wê girtîgehê de û piştî heyamê 4 salan bêkarbûn, di sala 1344'an de di nawenda "Serjimêrî a Îranê" mijûlî kar bû û hevdem dest bi xwendinê jî kir.

Yûnisî di sala 1356'an de li qutabxaneya bilind a Abûriya zankoya Sorbon a Firansayê karî medreka PHD di dersa sîkla siyasiyê wergire.

Di hemen sal de saziyek bi navê "Berevanî ji mafê mirov" ji aliyê navbirî ve hate avakirin û piştî şoreşa xelkê Îranê di dewrana serokwezîrî a Mihdî Bazirgan, weke yekemîn parêzgarê Kurdistanê hate hilbijartin, lê piştî du mehan dest ji vê postê berda.

Dr. Yûnisî şarezayiyek tewaw li zimanên Kurdî, Farsî, Îngilîzî û Firansewiyê de hebû ji wan zimana bo nivîsîn û wergêranên xwe mifahê werdigirt.

Navhatî zêdetir ji 10 berg roman û lêkolîn di warên çîrok, roman û hunerê nivîsandiye û pitir ji 60 wergêran di karnameya edebî a wî de cih girtine.

Dr. Yûnisî di pêwendî li gel dîroka edebiyat a Îran û cîhanê bi taybetî çîrok, roman, huner, siyaset û dîroka Îranê, lêkolîn li ser Kurdistanê û dîroka şer, xwediyê dehan berheman e.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi hinceta wefata Dr. Îbrahîm Yûnisî, nivîskar û wergêrê Kurd, peyama sersaxî û hevxemiya xwe pêkêşî malbat, xizm û kes, xelkê çanddost ê bane û nivîskarên Kurd û kesên çalak di warê çandî dike û xwe di xema wan hevpar dizane. Bi hêviya berdewabûna riya wî ji aliyê nivîskar û çalakên çandî ve.

# Dayîka 3 şehîdên riya rizgariya Kurdistanê li Urmiyê koça dawiyê kir

Roja şemî 11'ê Şibata 2012'an, dayika 3 şehîdên riya rizgariya Kurdistanê, piştî heyamek berxwedanî digel nesaxiyê di temenê 81 saliyê de koça dawiyê kir. "Fedîla Teraşî" keça "Ekber" ya gundê "Karêz"ê ser bi devera "Enzel"a Urmiyê ji malbeteke Kurdên Kuresunî hatibû dinê. "Fedîla" hertim xemxar û evîndarê doza Kurd û pêşmergên xebatkar ên riya rizgariya Kurdistanê bû.

Fedîla ku tenê sê xort hebûn, ji ber evîdariya ku bi welat re hebû, her sê xortên xwe û hevjiyê xwe di riya rizgariya Kurdistanê û bidestveanîna mafên mirovî û berheq ên netewa Kurd de gorî kirin û tevlî karwanê nemirên serbestiya Kurdistanê bûn.

"Begbaba Tahirî" hevjiyê Dayike Fedîla di sala 1362'an aRojî seba ku kurê wî "Yarmemed Tahirî" pêşmerge û fermandeyek Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bû, bi awayekî hovane bi destên kirêgirtiyên rêjîmê di nav baxê xwe de hate terorkirin.


Di 16'ê Rezbera 1363'an a Rojî de jî xortê din ê "Fedîla" bi navê "Yarmemed Tahirî" ku Serdesteyek pêşmergan û Fermanderekî jêhatî bû, bi destên îxanetkarekî di xew de tev hevalê xwe yê bi navê "Sadiq Kohîhat" hatin terorkirin.

Herwiha di 27'ê Xermanana 1373'an a Rojî de jî "Sohrab Tahirî" li gundê Karêzê şehîd bû, sala pişt re jî "Şabeddîn Tahirî" di roja 5'ê Pûşpera 1374'an a Rojî de piştî îşkenceyek hovane û dijwariyên zêde di girtîgeha Urmiyê de hat darvekirin û ew jî tevlî refên şehîdên sorxelat ên netewa Kurd bû.

Berpirsayetiya jin û zarokên wan şehîdan ket sitûyê "Fedîla"ê û bi van kovanan re wek şêre jinek Kurd jin û zarokên şehîd "Yarmemed" û şehîd "Şabeddîn" û malbata xwe heta roja diçe ser dilowaniya xwe xwedî dike û birêve dibe.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê sersaxiyê dide malbat û kes û kaerên wê û di kedera wan de xwe bi şirîk dizane.






# Astengiyên Demokrasiyê di Îranê de

**Beşa 2**

***Pênase û têgihîştinek ku rejîmên desthilatdar di Îranê de, çi niha û çi li demên berê ji çemkên weke netewe, şûnasa netewî û mafên netewî hebûne û hene, bixwe di zêdetirbûna bertengiyên siyasî û zewtkirina mafên hemwelatiyan rolek bingehîn heye.***

Heya niha pênaseyek yekgirtî ji wateya demokrasiyê nehatiye destnîşankirin, lê hinek pênaseyên pesendkirî ku ji aliyê çend teorîzanên zanista politîk ve, weke "Laypart", "Rabirt Dal" û "Şompêr" hatine pênasekirin, li ser çend xalên hevbeş ku beşek ji sitûnên bingehîn ên demokrasiyê tên hesibandin pêdagir in.

Girîngtirîn xalên çemka demokrasiyê ku li ser bingeha koma teoriyên zanistî ên politîkî hatine pênasekirin, pêk hatine ji: Hebûna saziyên siyasî, sinfî, çandî û civakî ên xweser, azadiya axaftin û bîr û boçûnan, hebûna çavkaniyên xweser û cur bi cur ên ragihandinan ku nebûna monopol û kontrola hikûmetî bi ser dezgehên ragihandinê, hebûna sîstemek azad a



**Ebdulla Hicab**

hilbijartinê, mafên wekhev li hember yasayê, tezmîna azadî a çalakî û riqabeta siyasî, pêbendbûn û rêzgirtina nawendên birêveberî û nawendên yasadanînê li hember deng û îradeya xelkê de û xweseriya nawenda qazayî û dadwerî.

Li ser bingeha mijarên baskirî, di sîstemek siyasiya demokratîk de, biryarder xelk in. demokrasî anko demokrasiya lîberal ku bi demokrasiyên serketî ên îroyîn tê gotin, serketina xwe ji riya pêbendbûn bi bingehên demokrasî weke, hilbijartinên azad, azadiya bîr û boçûnan, pêkanîna mafên malikiyeta takekesî, azadiyên siyasî û wekheviya hemwelatiyan li hember yasayê de, bi dest xistiye.

Demokrasiyên Rojavayî ku sîstemên girêdayî bi dengê piraniya xelkê nûneratî dike, maf û azadiyên demokratîk bo xelkê misoger û cihgîr kiriye û tezmîn û rêzgirtin ji mafên takekesî ji usûlên bingehîn ên wan sîsteman tê hesibandin. Herweha rêzgirtin ji mafên kom û girûpan, rêzgirtin li şonas û mafên neteweyên ku derveyî bazneya desthilatê ne, danîna yasayên welat li gel usûlên cîhanî ên mafê mirov û cî bi cîkirina mafên kêmahiyên qewmî, olî û zimanî ew mijarên bingehînên ku asta rewayî a sastemek demokratîkê jorde dibe.

Demokrasî ji modelên cur bi cur pêk hatiye. Lê awayên cur bi cur ên wan li ser hemen usûlên baskirî sekinîne. Di welatên pirnetewî de, dibe ji demokrasiya herêmî anku dana desthilatê bi nawendên herêmî û jordebirina asta beşdariya kêmaniyan mifah stand, anku beşdariya girûpên derveyî bazneya desthilatê di birêvebirina kar û barên siyasî ên welat, rêçareya misogerkirina demokrasiyê tê hesibandin ku dikare rolek baş di çareseriya pirsên netewî de bilîz e.

Bi liberçavgirtina vê yekê ku rewşa her welatekê hilgira modelek taybet bi wî welatî ye, lê beşek berçav ji usûlên demokrasîyê, negor, wekhev û cîhanî ne. Welatên cîhana sêyemîn, bitaybetî welatên Rojhilata Navîn, cîhanîbûn û giştgîrbûna usulên demokrasiyê qebûl nakin, herweha karbidestên hikûmetî ên wan welatan armancên welatên Rojavayî di xistine ber basa demokrasiyê, mijarek biguman û nerast dizanin û lewma pêşî ji geşekirina demokrasiyê di welatên xwe de digrin.

Lêkolîna progiramên welatên Rojavayî derbarê mifahstandin ji diyardeya demokrasî weke alavek bo pêşvebirina armancên xwe di çarçoveya mijara me de cih nagre. Ya ku me berçav girtiye, pêwendiya demokrasiyê li gel rêzgirtin ji nasnameya netewî û çareseriya aştiyane a pirsgirêkên netewî di welatên pirnetewî weke Îranê de ye, vî welatî di herêmên cur bi cur weke Kurdistan, Sîstan û Belûçistan, Turkmensehra, Azerbaycan û herêmên Erebî, tûşî pirsgirêkên cur bi cur bûye.

Îran weke welatên cînar ên xwe xincî Îraq, ew jî di astekê gellek berteng heya niha bingehên demokrasiyê seba çareseriya pirsên siyasî bikar neaniye û daxwazên girûpên netewî û qewmî dibe sedema bertengkirina her çi zêdetir a usulên demokrasiyê di nav yasayên xwe de. Pênase û têgihîştinek ku rejîmên desthilatdar di Îranê de, çi niha û çi li demên berê ji çemkên weke netewe, şûnasa netewî û mafên netewî hebûne û hene, bixwe di zêdetirbûna bertengiyên siyasî û zewtkirina mafên hemwelatiyan rolek bingehîn heye.

# Terorîzma Rejîma Komara îslamî çalaktir bûye

**Wêneya jina tavanbar bi êrişên terorîstî li Taylendê hat bilav kirin.**

Leyla Ruhanî, jina Îranî ku bi tometa dest hebûn di kiryarên terorîstî yên roja çarşemî di Bankoka Taylendê de hatibû diyar kirin, kariye Taylendê bi cih bihêle û vegere Îranê. H33evdem dozgeriya cinayî a Taylendê jî biryara destbiser kirina vê pejirand.

Herweha sê terorîstên şandî ji aliyê Wezareta îtilat a Komara Îslamî ve ku şeva pêş teqînê di yek ji cihên xwarin û vexarinê û bi jinên leşfiroş re li Bankokê de derbas kiribûn, berî ku bikarin vegerin Îranê her yek bi awayekê hatin destbiser kirin, lê kesê çarem ku Leyla Ruhanî ye reviya û gehişt Îranê.

Mesûd Sadiqzade, Mihemed Xezanî û Seîd Muradî, ew sê terorîst in ku wêneyên van di mobila keçikek leşfiroş a taylendî de hatin dîtin ku heyamê çend rojan bûye digel du keçikên din derbas kiribûn û mêvanên şevan ên malên wan bûn.





# Hikûmeta bê pêgeh

***Bûyerên sala borî di welatên Ereb ên Rojhilata Navîn de, wisa pêşan didin ku encama wê bahozê bi têkçûna rejîma Esed li Sûriyê û Komara Îslamî li Îranê bi destê gelên nerazî bi dawî dibe***



Azad Kurdî

Serhildana berfireh ya neteweyên Îranê di zivistana 1979'an de bû mijara herî giring a rojev navxwe, navçe û asta navneteweyî. Gelên têhniyê azadî û demokrasiyê li seranserî Îranê şoreş bi bedelên giran û xwîna sor ser xistin. Lê encama wê şoreş û serhildana azadîxwazane û rizgarî ji destê rejîma dîktatoriya Şahenşahî, berevajî vîn û xwesteka gelên Îranê derket.

Mirov dikare bêje ku nemana hikûmeta Şahenşahî, welatên Rojava ku wê demê rikeberiyek xurt bi Bilûka welatên Sosyalîsît re hebûn, ji bo ku alternatîvek baş bo parastina berjewendiyên xwe li hemberî eniya sosyalîstî di Îranê de peyda bikin, tedbîr kirin ku sîstemek olî li Îranê bînin ser kar, da ku pêşiya pêşdeçûna Komunîzmê bo Rojhilata Navîn bigire. Xomeynî û dar û desteken wî alternatîva herî baş bûn ji bo Eniya Kapîtalîsî ku derxin qadê û anîn jî. Ji xwe viyan, îrade û xwestekên neteweyên Îranê ku şoreş kiribûn û çi dixwestin, ji wan re ne giring bûn.

Zêdeyî 30 sal ji temenê Komara Îslamî ya Îranê re derbas dibe. Hikûmetek ku bingeha dîktatoriyeta xwe di referandoma rûyekî ya Adara 1980'an de stand. Ji ber ku di wê pêngava ne demokratîk ya rejîma Xomeynî de ti alternatîvek nû ji xeynî hilbijartina rejîma dîktator a berê û Hikûmeta Îslamî ya nû nebû! Rojhlatê Kurdistanê bi pêşengiya PDKÎ ew referandom boykot kir û tê de beşdarî nekir. PDKÎ yekemîn û take partiya siyasî bû wê demê ku naverok û cewhera rejîma Xomeynî bi başî nas kiribû. Sedem jî ew bû u rejîma nû ti giringî û baldanek nedida xwestekên neteweyî û demokratîk yên neteweya Kurd ku bi awayekî sivîl û aştrîxwazane dianîn holê. Siyaseta dewleta Xomeynî jî red û înkarkirina mafên Kurdan bû.

Hikûmeta olî ya Xomeynî piştî ku hêdî hêdî bingehên xwe xurt kir, dest bi mîlîtarîzekirina hemû navçeyaên Îranê kir, bi taybet deverên wek Kurdistan ku tevgera neteweyî tê de çalak bû û doza mafê Kurdan û çareserkirina pirsa Kurd di çarçoveya Îranê de dikir. Dehan sazî û dezgehên leşkerî û ewlekariyê hatin avakirin. Atmosfera welat ji wê demê heta niha li Kurdistanê û gelek deverên cihê niştecihbûna neteweyên Îranê ewlekarî û mîlîtarîzekirî ye. Dirûşmîn serxwebûn, azadî û edaleta civakî ku sloganên berçav ên rejîma nû bûn, niha êdî bi tevahî avala bûne û bûne fosîl! Ne wekhevî û gendelî di 33 sal temenê Komara Îslamî bêdadê dike, li gor serhejmariyê navneteweyî, Komara Îslamî yek ji pergalên herî gendel di cîhanê de ye. Dengê hemû liv û tevgerek demokrasîxwazane û mafxwa zane bi serkut û qirkirina sîstematkî hat/tî dan. Her diçe valahiyek zêde dikeve navbera xelkê û rejîmê, ji ber ku ti guhertin û xwestekek siyasî, aborî, civakî û çandî ku gelên Îranê jê re şoreş kiribûn, nehatine cîh. Berevajî wê, atmosfera tirs, xof û bêdengiyê li ser civakê hat ferzkirin. Hemû pîvan û mercên sîstemek demokratîk hatin piştguh xistin û azadiyên demokratîk niha piştî 33 salan ji bo gelên Îranê bûne xewn û xeyal...

Di 33 salên borî de hemû metod û rêbazên ne demokratîk ji aliyê rayedarên vê hikûmetê ve hatin rêvebirin. Komara Îslamî tu nirx û bihayek nedaye û nade îrade û dengê neteweyên Îranê. Dehan dezgehên ne hilbijartî û ferzkirî ji aliyê serokê olî hatin avakirin ku ew ji xelkê re diyar dikin ku rêveberî çawa dibe û kî dibe. Li gor wan, tenê Meleyên olî karîna diyarîkirina çarenûsa xelkê hene û ji wan re biryarên çarenûssaz bidin, xelk ne balix e û ne xwediyê wê hişmendiyê ye ku bikare çarenûsa xwe bi destê xwe diyar bikin!

Bi vî awayî Komara Îslamî rewatiya xwe ji xelkê wernagire, ji ber ku îradeya giştî ji wan re ne giring e. Karnameya 33 salên borî vê yekê diselimîne û nerazîbûnên veşartî yên sivîl û xurt ên civatên xelkê li Îranê vê yekê derdixe holê. Ev ne îdea ne. Gelên nerazî ji her derfetek biçûk ku di sîstema dîktator û qirker a Komara Îslamî de pêk tê, dengê xwe diherikînin û doza maf û azadiyên xwe yên ji destçûyî dikin û nerazîbûn û dijberiya xwe ligel tewahiya sîstema Komara Îslamî pêşan didin.

Bûyerên sala borî di welatên Ereb ên Rojhilata Navîn de, wisa pêşan didin ku encama wê bahozê bi têkçûna rejîma Esed li Sûriyê û Komara Îslamî li Îranê bi destê gelên nerazî bi dawî dibe. Ji ber ku hikûmetek bê pêgeha cemawerî di nav gelan de tunebe û berheqî û rewatiya xwe ji dengê gelan û viyana wan nestîne û nekeve ber proseya demokratîk a hilbijartina azad, nikare zêde temenê desthilata xwe berdewam bike.

# Niqurçk

## Mehmûd bêt? Bila bêt!



Ceifer Mubeşirniya

Mehmûd Ehmedînijad got: Ji bo hizûra me di valayiya esmanan de gerek em hewl bidin berî sala 2022'an hemû îmkanatên xwe amade bikin!!!

Wella Mehmûd tu guh min bikî, wê gellek zûtir xwe amade bikî!!! Serê te û bavê te, bahozek bixeter di rê de ye û ji bo ku we di xwe de wernepêçe û wunda neke, ji niha ve di hizra vedîtina cihekî dervey koreya erdî de be!!! Bi rastî li ser koreya erdî cihek ji bo we nine. Çunku pêka îdiayên we, cihê we di asîmanan de ye!!!, him jî ma we kesek ji xwe re li ser erdî hiştiye? Zûbe Mehmûd bike "tawa bezê" ji min bibîze "avê ku da serî, çi bihostek be, çi çar tilî".

Vêca Mehmûd canê xwe nazand û got:"Em li ser duriyanekê ne, em nizanin ka biçin koreya Heyvê yan jî koreya Mirîx"!!!. Bawer bike ferq nake biçî kîjanê, çawa tu hatî ser koreya Erdê û mîna hovekê bûye, dê li koreyên din de jî her ew rimûzade bî. Vêca bixwe her di valayiya esmanan de li benda "Decal" bimîne heya kerê xwe tîne û te pişt xwe siwar dike!!!



***************

## Dîsa Mehmûd dîsa Mehmûd

Mehmûdê min îznê nade ku yekî din gazî bikim. Wî got: "Em paqijtirîn dewleta Cîhanê ne!!!. Way tu li wî kuzirîkê derewîn û wê derewa hinde mezin. Kuro Mehmûd bes e, canê min bese te hetka xwe bir. Başe tu ji kê re wan axaftinan dikî?

"Dîzikê got: Binê min zêr e, huskûyê got: Ez ser û binên te geriyame". Hey mala te, he îsal we 3 hezar milyard dolar di bank de dizîn, he îsal we çend hewlên terorîstî li çend welatên cîhanê de dan, he îsal we sedan kes îdam kirin, dehan kasibkarên Kurd li ser sînoran bi gulleyên we hatin kuştin, niha jî xelkê azadîxwaz yê Sûriyê bedelê şerxwazî, fitneçîtî û terorîzma we didin. Çavbelekê qopo!!, ma tu nizanî navê dewleta te li dawiya lîsteyê cîhanê ye. Lê ji te nagirim, hetmen dîsan te gelek mewad kişandiye û renge te lîste ser û bin girtibe!!!



www.arsivakurdi.org



# Car din bazerganî kirin bi kerameta mirovan!

***Mixabin dewleta Çîn û Rûsiyê car din çavê xwe ji terajîdiyayek din a mirovî niqandin û parastina bihayên mirovî û kerameta însanan kirine qurbaniyê dan û standinên bazerganî û berjewendiyên abûrî tevî dewleta dîktator û mirovkuj a Sûriyê.***



**Dara Ntiq**

Heyamê zêdetir ji 11 heyvan e ku xelkê azadîxwaz yê Sûriyê bi awayek hovane û dûr ji her terze yasa û rêsayek mirovî, ji aliyê rejîma dîktator û xwînrêj a Beşar Esed ve, bi awayên herî tund tên tepeserkirin û rojê bi deyan kes ji xelkê narazî ê wî welatî, bi destê hêzên mirovkuj yên wê rejîmê û bi harîkariya locîstîkî a Sipaha Qodis a Îranê û Hizbullaha Lubnanê ve tên kuştin. Pêka amarên NY tenê di destpêka xwenîşandanên gelê Sûriyê di 11 heyvên derbasbûyî de, zêdetir ji şeş hezar hemwilatiyên sivîl ên Sûriyê bûne qurbanî ku piraniya wan jin û zarok in.

Roj li rojê zêdetirbûna komkujî û tund û tûjiyên dewleta Sûriyê derheq bi xelkê sivîl û azadîxwaz yê wî welatî û di hemen demê de helwesta bêşermane û dûr ji pirensîbên mirovî ên welatê Çîn û Rûsiyê, bi tewahî civaka mirovahiyê bi şok û heyrîmanê re hevrîş kir û bû hegera nigeranî û nerazîbûna bîr û hizrên giştî. Piştî cehdên bêencam yên Komkara Erebî bo dawîanîna tund û tûjiyên rejîma Sûriyê û sekinandina maşîna tepeserî û komkujiya hovane a rejîma Esed, bi neçar keysa wî welatî ji aliyê Komkara Erebî ve, ji Konseya Ewlekariyê re hat şandin.

NY jî 16’ê Rêbendana îsal, bi merema sekinandina binpêkirina mafê mirovan, komkujiya hemwelatiyên sivîl, girtin û eşkencekirina xwenîşanderan, rojnamevan û kesên siyasî û sivîl, tepeseriya hêzên ewlehiye rejîmê û dawîanîn bi deshilata dîktator a Beşar Esed û pêkanîna hikûmetek demokratîk û nîştemanî, biryarnameyek amade kirbû ku mixabin ji aliyê helwesta neberpirsyarane a dîplomatên Çîn û Rûsiyê ve hat veto kirin.

Helwestek ku bû bi sedema bêzariya civaka navneteweyî û herwisan nerazîbûna tevgera demokrasîxwaz a Sûriyê û di hemen demê de jî, dana îzinnameyek bi rejîma mirovkuj a Esed bo tepeserkirin û komkujiya zêdetir a xelkê sivîl û mafxwaz a wî welatî.

Di demekê de ku raya giştî û bi taybetî gelên serhildêr û azadîxwaz yê Sûriyê çavnihêrê biryarnameya Şivra Tenahiyê bûn bo ragirtina komkujî û tund û tûjiyên vî welatî û dawîanîn bi deshilata dehan sale a dîktatoriya Beşar Esed û cihgîrkirina aştî û azadiyê di welatê dîktatorlêdaye ê Sûriyê de, mixabin dewleta Çîn û Rûsiyê car din çavê xwe ji terajîdiyayek din a mirovî noqandin û parastina bihayên mirovî û kerameta însanan kire qurbaniyê sat û sewdayên bazerganî û berjewendiyên abûrî tevî dewleta dîktator û mirovkuj a Sûriyê û hewsûçbûna tevî cenayetên vê rejîmê.

Bêşik helwêsta neberpirsyarane a wan du welatan ne tenê pêvajoya komkujî û tepeserkirina nemirovane a rejîma Esed derhq bi xelkê sivîl yê wî welatî nesekinand, belku bû bi hegera zêdetirbûna tund û tûjiyê û komkujiya zêdetir a xwenîşanderan.

Helwestek ku hitbar û heybeta NY bire bin pirsyarê û bû bi hegera kerb û kîna xelkê mafxwaz û bêzare Sûriyê û mehkûmiyeta raya giştî pêre bû. Helwestek ku tenê tevî pêşwaziya germ a dost û hevalbendên nizîk ê wê rejîmê anku Komara sêdare a Îranê û girûpên tundajo yên weke Hizbullah û Hemasê, ku pilandarêj û arîkarê sereke yê hêzên tepeserkare rejîma Sûriyê ne, berbirû bû.

Helwestek ku pêvajoya bûyeran di sûriyê de, ber bi kirîzek aloz û şerek tayifî û nexwastî ve dibe. Bi awayek ku eniya demokrasîxwaz di asta cîhanî de yê piştgîriya xwenîşander û xelkê azadîxwaz yê wî welatî bike û eniya pawanxwaz û dijî mirovî jî cehda parastina rejîma Esed û tepeserkirina xelkê sivîl dike. Niha zaf ji welatên cîhanî û herêmî bi taybetî welatên Erebî bi nîşaneya nerazîbûn ji berdewambûn û geşekirina pêvajoya komkujî û tepeseriya xelkê Sûriyê, balyûzên xwe li wî welatî vekişandin û bazneya durpêçên bo ser wî welatî roj li rojê berfirehtir dibe û cehd û xebat bo asayî kirin û sekinandina tund û tûjiyên Sûriyê di asta raya giştî de berdewam e.

Ji aliyek din ve, Komara Îslamî û hevhizrên vê bi hemî awayekê bo parastina deshilata dîktator a Esed û tepeserkirina bêrehmaneya xelkê narazî dixebitin.

Helwestek ku ne tenê tu bandorek li ser vemirandina seha azadîxwazane a xelkê wî welatî nebû, belku ev xelkê şpreşvan serbarê şermezarkirina helwesta neberpirsane a Çîn û Rûsiyê, bigurtir ji derbasbûyî hawara mafxwazane a xwe bilind kirine û niah bi piştrastbûn bi hêz û îradeya azadîxwazane a xwe û serbarê komkujî û tund û tûjiyên hêzên mirovkuj yên rejîma Esed, xebat û tekoşîna mafxwazane a xwe di pêxema nehêlana dîktatorî û cihgîrkirina aştî û azadî û dadperweriya civakî û gihîştin bi armancên mirovî ên xwe didomînin.

Herwisa bi dirêjîdan bi fîdakariya xwe di pêxema nehêlana dîktatoriyê de, dane eyanê ku ewên ku di pêxema pawanxwazî û berjewendiyên xwe de, bazerganiyê bi mafê mirov û buha û kerameta însanan dikin, riswa û şermezarê dîrokê ne.

www.arsivakurdi.org




# Zimanê dayîkê bingeha herî serekî a şunasa netewî

***Ziman wek alava herî girîng ya pêwendîgirtin, eyankirin, têgehandin, û têgihşîtin yek ji sitûnên herî giring ê pêkînerê şûnasa netewî ya neteweyan e.***

X“aka welatan tenê bi şûr û şemşîran nahê dagîrkirin, bi riya ziman jî xakek herî berfireh dikare bê dagîr kirin. Bizane ku dujminên te çawan te dikêşne jêr per û baskên xwe de, da ku peyvên zimanê dayîkê li ser zimanê te hilînin û peyvên xwe bêxne ser zimanê te. Ew neteweya ku zimanê xwe ji bîr bike, êdî nikare netewe be. Neteweya bendkirî ji aliyê biyaniyan ve, wek ava li pişt bendavan de ye.

Di dawiyê de rojekê bendav wê biherife û rûbarên biçûk wê pêkve girê bide. Ziman jî ew av e. Av her tim av e, çi li pişt bendavê be, çi li aliyê din ê bendavê be. Ziaman ew ava bihêz e ku bi aramî di nav valatiya keviran de diçe û neteweyên pirş û bilavbûyî li pişt sînoran digehîne yektir”. (beşek ji şîretên Îstfan Nimanya avakerê kilîsaya Ortodoks”.

Ziman wek emraza herî giring ya pêwendîgirtin, eyankirin, têgehandin, û têgihşîtin yek ji sitûnên herî giring ê pêkînerê şûnasa netewî ya neteweyan e. Ew şûnasa ku aliyê kêm li heyamê zêdetir ji sê dehikan deshilatdariya rejîma Îranê de hewla helandin û



Şehab Xalidî

jinavbirina wê hatiye dan, lê yek ji egerên herî xwedîhêz ên berdewamiya xebata netewên zulmlêkirî ên welatê me û bi taybetî kurdan bi dijî rejîma kevneperest a Îranê parastina vê nasnameyê ye ku tehlûkeya helandina li nav ziman û kultura bi fermîkirî ji aliyê rejîma nedadperwer a Îslamiya Îranê ve li ser e.

Ew hemû hewlên rejîma Îranê bona birêvebirina siyaseta helandina zimanê neteweyan di nav yek ziman û yek çandî de, ku pêştir hemen siyaset ji aliyê Rezaxan paşayê wê demê ê Îranê ve jî bi dijî neteweyan dihate birêve birin, di demekê de ye ku di welatek wek Hindustanê de 19 zimanên bi fermîkirî û li Afrîqaya Başûr 11 zimanên fermî hene.

Lê di welatê me de serbarê qedexeya xwendin û nivîsîna bi zimanê dayîkê li qonxên xwendinê de, hewleke bernamedarêtî û sîstematîk bo helandina ziman û kultura neteweyan heye ku ew yek di rastî de bêdadî û zulma herî bê sînor e, ku derheq mafên yasayî û însanî ê neteweyan tê kirin.

Herweha tewaya wan hewlên rejîma Îranê berevajiyê benda 30’î ya biryarnameyeke pesendkirî ji aliyê NY li sala 1989’an de ye ku gellek bi eşkereyî pêdagiriyê li ser mafê xwendin û nivîsîna bi zimanê dayîkê dike û têde hatiye: “kêmaniyên ayînî, qewmî, yan zimanî, mafê vê yekê hene ku bi awayê bi kom, yan jî wek tak, ziman, çand û ayîna xwe bikar bînin û mifahê jê wergirin”. Giringiya biryarek bi vî awayî wê demê zêdetir eşkere dibe ku di sala 1991’an de jî UNSCO’yê li ser pêşniyara welatê Bengiladêşê roja 21’ê Şibatê wek roja zimanê dayîkê daye naskirin.

Herçend Şêvra Bilind a Şoreşa Çandî a Îranê li meha Cozerdana sala 1388’an de pêşniyara hînkirina zimanên herêmî û “qewmî” li hinek ji zanîngehên wî welatî de pesend kir, ku li gor vê îzin bi hinek ji wezaretxaneyan hate dan ku du wahidên dersî ên ziman û wêjeya neteweyên xeyrî Fars wek Azerî, Kurd, Belûç û Turkemen li zanîngehên nawendî ên parêzgehên pêwendîdar, bi şêweyên dilxwaz ders bêne gotin, lê bi baldan bi vê ku heya dana mafê xwendina bi zimanê dayîkê li qonaxên xwendinê de di çarçoveya benda pazde ya yasaya bingehîn de jî ku têde hatiye:

“ mifah wergirtina ji zimanên herêmî û qewmî li çapemeniyan û ragehandinên giştî de, û ders gotina wêjeya wan li xwendegehan de li rex zimanê Farsî azad e”, tenê beşek ji xwestek û daxwaziya neteweyên bindest ên Îranê ye, û ew jî nehatiye cîbicî kirin, gelo ew biryara Şêvra Bilind a Şoreşa Çandî çawan dikare biryarek ew qas girîng be ku bikare wan neteweyên xebatkar razî û bêdeng bike?!

Bê guman biryarek bi vî awayî ew jî bi vê şêweya ku ew dixwazin birêve bibin, tenê ji bo xapandinê û kêmtirkirina zext û givaşan bo ser xwe nebe, nikare tu tiştek din be, û nikare li çarçoveya giringîdana rejîmê bi xwestekên neteweyên Îranê bê hesibandin. Birêvenebirina benda 15’ê ya Yasaya Bingehînjî yek ji xalên herî bihêz yên pêdagirbûna neteweyên zulimlêkirî ên welatê me li ser xebata bi dijî deshilata ne dadperwera rejîma Îranê ye, û tê çavrê kirin ku ew xebat hemû salê li roja 21’ê Şibatê de rengdaneweyek diyar û berçavtir hebe.

Herweha xoretên gelê Kurd û neteweyên zulimlêkirî ên din ên Îranê ku mafê xwendin û nivîsîna bi zimanê dayîkê ji wan hatiye zewt kirin, cuda ji vê ku dikarin roja 21’ê Şibatê bikne roja eşkerekirina kerb û kîn û bêzariya xwe ji siyasetên dijî mirovî ên rejîma Îranê, di hemen demê de jî dikarin ku vê rojê bikne roja nasandina zêdetir ya kultur û çand û zimanê xwe bi bîr û raya giştî û heta rêkxirawên herî bi bandor ên navnetewî.

Ku ew hewla herçend jî nekare rejîmê di warê hewildana bo helandina kultur û zimanê neteweyan, neçar bi paşvekêşanê jî bike, lê aliyê kêm dikare egerek xwedî hêz be ji bo parastin û heta geşekirina ziman wek bingeha serekî ya nasnameya netewî.

www.arsivakurdi.org

# Ehwaz ezmûnek din ya neteweyên Îranê



Aso Salih

Li gorî rapora rêkxirawa çavdêr a mafê mirovan hêzên ewlekariya rejîma Îranê li destpêka sala nû ya Zayînî de heya niha pitir ji 65 kes destbiser kirine. Li gorî vê raporê du kes ji girtiyan li girtîgehên wezareta Îtilaatê de hatin kuştin. Navê wan du kesan jî bi vî awayî hatiye ragehandin: Mihemed Ke'bî 34 salî, û Nasir Albuşokêyê Derefşan 19 salî. Ew yek di demekê de ye ku ên girtî heya niha tawan yan tawanên wan bi wan nehatiye ragehandin û bo dadgehê nehatine birin. Li gorî çavkaniyên nûçeyan girtina berfireh a xelkê li bajarên Şûş, Hemîdiye, û Ehwazê, li bersiva dîwarnûsî, û druşmnivîsînên bi armanca tehrîma hilbijartinên parlementoya Îranê û herweha piştevaniya ji Buhara Erebî bûye.

**Ehwaz û kirîzên Îran**

Di rastî de girtina xelkê Ehwazê pêwendî bi wan kirîzan ve heye ku li navxwe a welat de ne. Kirîza yekemîn kirîza rewayiyê ye. Komara Îslamiya Îranê hemû demekê ew rewayiya bi berçav ya xwe li riya zorbûna hijmara dengderan li hilbijartinan de û herweha nîşandana dîmenên xelkê wergirtiye. Lê piştî hilbijartina serkomariyê li sala 1388'an de û destpêkirina nerizayetiya xelkê hevçax di gel tepeseriya ji aliyê deshilatê ve, ew rewayî bire jêr pirsyarê. Ew nerizayetî bû sedema vê ku beşek ji hakimiyetê jî lê cuda be û deshilat li cem kirîza rewayiyê, di gel kirîza navxweyî ya xwe jî berbirû be.

Hevçax li yek sala borî de heya niha Buhara Erebî û pêla demokrasîxwaziyê li welatên Rojhilata Navîn de dest pêkiriye. Ew pêl ku hevdem li gel kirîza aboriya li Îranê û zortirbûna nerizayetiya xelkê ye, karbidestên komara Îslamiya Îranê jî gellek dilgiran kiriye.

Koma wan du kirîzan dibe sedema vê ku rejîm taba tu nerizayetiyekê neîne. Tecrubeya çend dewrên hilbijartinan li serdemê serkomariya îslamî ya Îranê de nîşan daye ku li wan deman de hinekê azadî zortir dibe, lê rewşa na asayî ya vê carê em dibînin ku reftara hakimiyetê guhertiye, û dibe sedema vê tişta ku niha em dibînin. Wate daxistina zortir ya rojnameyan, daxistina zortir ya fezayê çalakiya civakî, û tepeseriya xelkê li Ehwazê.

**Rewşa taybetî ya neteweyên Îranê**

Cuda ji vê dîtingeha giştî rewşa neteweyan li Îranê de hinek ferq û cudahî heye. Xelkê wan herêman hinek daxwazî hene ku dibe sedema vê ku nawenda sereke ya nerizayetiyan ew herêmane bin. Nerizayetiya xelkê li Azerbaycan, Kurdistan, Belûçistan û Ehwazê li salên borî de ew rastiya selimandiye. Her ew yek jî bûye sedema vê ku hêzên ewlekariyê zortir li wan herêman de bin û rewşa ewlehî û mîlîtarîzebûnê berçavtir be. Wate taba deshilatê derheq nerizayetiyan gellek kêmtir dibe, û dibe sedema vê ku piştî nivîsîna hinek diruşman li Ehwazê de, pitir ji 65 kesan werin girtin û du kes jî li girtîgehan decanê xwe ji dest bidin.

Deshilata Komara Îslamiya Îranê li çar serdemên cuda û her car bi şêweyekê siyaseta tepeseriya neteweyên Îranê peyrew kiriye. Piştî şoreşa gelên Îranê, li serdmê şer, li serdemê piştî şer û niha. Li serdemê îro de ku hinek destewajeyên netewî anîne nav wêjeya siyasî ya deshilatê. Ji vê dîtingehê ve ji çemk û têgeha "cudahîxwazî" ku niha barek giran di nav deshilat, opozisyon, û heta beşek zaf ji xelkê de heye, mifahê werdigre û bi vî awayî tepeseriya neteweyên Îranî li pêxema livandina hesta netewî ya xelkê, wek karekî pozetîv nîşan dide. Ew pirs helbet kartêkirina wê li ser beşek zaf ji opozisyona Komara Îslamî li derveyî welat hebû û hêlek sor ji bo piştevaniya kêmneteweyên Îranê pêk aniye.

**Dîtingeha hewşêwe**

Dîtingeha hewşêwe bo neteweyên Îranê tenê di nav Komara Îslamiya Îranê de nine, belku beşek berçav ji opozisyona navxwe û derve jî dîtingehek weha hene. Komara Îslamiya Îranê ku deshilat di desta de ye, ew cure dîtingeh dibe sedema pêkhatina dîtingehek ewlekarî û tepeseriyê. Lê opozisyon ku beşek zaf ji mîdyayan di dest de ye, dibe sedema bilavnebûna nûçeyên wan herêman.

Ezmûna nerizayetiya xelkê Kurdistanê û Azerbaycanê di wan salên borî de, şêweya lênihêrîna li kêşeya Belûçistanê û ew girup yan rêkxirawên ku li wir çalak in, û tecrubeya wan dawyane ya Ehwazê vê rastiyê diselimîne ku mîdyaya opozisyonê bi bêdengiya xwe, li pêxema bêdengkirina dengê nerizayetiya neteweyên Îranê û qebulkirina reftara Komara Îslamiya Îranê di wan herêman de kar kirine.

Reftara rejîma Îranê li pêxema binpêkirina mafê neteweyên Îranê û tepeseriya wî xelkê, dij bi her cure pîwaneke mafê mirovan e. Lê bêdengiya mîdya û rêkxirawên mafê mirov jî, heke piştevanê vê reftarê nebe, lê rê xweş dike bo domandina vê reftarê ji aliyê rejîma Îranê ve.

Rojev



# Şerê herêmî yê Esed, Îran, Îraq û Eelqaîdê, bi dijî xelkê Sûriyê

W: Agirî

Rojnamevanê Ereb, Ebdurrehman Raşid, rewşa Sûriyê bi şerekî herêmî şiband ku ji aliyekî ve hêzên tepeserkar yên Esed, hêzên Hizbullaha Lubnan, Tehran û Bexdayê cih girtine û ji alîyê din ve jî, gelên mafxwaz yên Sûriyê cih girtine ku di pêxema azadî û demokrasiyê de dixebitin.

Navbirî dı wê gotara xwe de ku lı rojnameya Şerqulewsetê de belav büye qala vê yekê dike ku, welatê Îraqê ji xwe hertim di bin gef û êrîşên terorîstî yên Elqaêdê de ye, di hemen demê de jî yek ji çavkaniyên sereke yê silahên nizamî û harîkarê nihayî yê rejîma Esed e.

Ewa di halekê de ye ku tora terorîstî a Elqaîdê di heyamê 7 salên derbasbûyî de ji hêla rejîma Esed we di warê alavên nizamî û locîstîkî û perwerdehî ve piştevanî jê dihate kirin. Îran hemî gavekê êvirgeha rêberên payebilind yê vê tora terorîstî bûye. Lewma ew niha dixwazin ku Elqaîdê tevlî rewş û pevçûnên niha yên Sûriyê bikin ku bikarbin rewş û zirûfa heyî gor dilê xwe biguherînin. Navbirî herwusan dide eyanê ku Tehran û Demişq dixwazin ku bi vê helwest û biryara xwe, raya giştî ji encama bûyer û tevgera azadîxwazî a gelên sûriyê bitirsînin û wisan bidin eyanê ku ger pêvajoya han bigehîje encamekê, yê tora Elqaîdê weke hêza xwedî deshilat ji dewsa rejîma Esed bête serkar.

Nivîskar dibêje ku, Niha şûnde êdî em nikarin helwest û bûyerên heyî, di hedê şer û pevçûnên navbera hêzên tepeserkar û xwenîşanderên nerazî yên dijberî rejîma Sûriyê de bibînin. Di Sûriyê de şerekî dijwar û kawilkirî di rê de ye ku armanca wê guhertina rûçkê rastîne civak û welêt bi derba agir û silahê ye. Navbirî dide xuya kirin ku dema, Îran, Îraq, Hizbullah û Elqaîdî li cem rejîma Esed, li hember xelkê bêberevan yê Sûriyê cih digrin, mirov dê çi çavnihêriyek jê hebe. Erê gelo kesek heye ku harîkariya wî xelkî bike ku netenê ji tev pêdiviyên sereke yên jiyanê bêpar in, jiberku nemaze mafê jiyanê jî ji wan tê standin. Welatê Ordenê hin penahgeh çêkirine, lê tu kesek dikare xwe bigehîne wêrê? Turkiye carnan hin hişdariyan dide û penahgeh jî ava kirine, lê bi dorpêç û hebûna wan hikûmetên neyar, rêya revê ji xelkê nerazî û sivîl hatiye bend kirin. niha di rastî de, 20 milyon ji xelkê Sûriyê di nava dorpêça 5 hêzên pawanxwaz û mirovkuj yên herêmî de asê bûne, bêyî ku ji hêla tu yek ji welatên rojavayî yan navneteveyî ve bihên piştewanî kirin.

Li gor gotara nivîskar, Îran tev harîkariyên nizamî, locîstîkî û malî dixe xizmeta rejîma Esed heya ku xelkê xwe pê tepeser bike. Îraq, him bi harîkariyên malî, abûrî û neftî li cem Esed sekinye û nahêle dorpêçên cîhanî, bandorên xwe li ser rejîma Esed bikin. Rûsiye jî di asta navneteweyî de, mijûlê peçavtin û veşartina cinayetên rejîma Esed e. Lewra mirov nikare rewşa heyî bi tenê hovîtiya hikûmetekê bi dijî xelkê vê bihesibîne, jibelku ew yek, êrîşek herêmî ye bi dijî xelkê nerazî û sivîl yê wî welatî.

Raşid di dawiya mijara xwe de, dinivîse ku, niha dirêjiya wan aloziyan bi qazancê Tehranê ye ku dixwaze Sûriyê ji hev belav bike û bike peşqela agir, heya ku mirina Esed, weke birgeha herî girîng a lîstika xwe birevîne. Di rewşek han de, ewa mafê gelên Sûriyê ye ku ji me harîkariyê bixwazin û erkê me ye ku em ji hewara wan bên.

www.arsivakurdi.org



# Hêla hejariyê îro di îranê de

***Abûriya rejîma Îranê di bin bandora gelek arîşe û gefên micid deya ku ew jî vedigere ser lewaz bûna sîstema siyasî û birêveberiya nedirust a hikumetê û herweha xirab bikaranîna samanên netewî***



**Arif Velzî**

Li çend rojên derbas bûyî de Ce'fer Qadirî nûnerê Bajarê Şîrazê di Parlemêntoya Komara Îslamî de ku herweha Endamê Komisyona Bername û Bûdceya Parlementoyê ye jî, ragehand ku hêla hejariyê di Îranê de îsal gihîşte 960 hezar tûmenî.

Eva di demekê de ye ku berevajî gotinên nûnerê bajarê şîrazê li gor raporên fermî ên hikumetî pitir ji 15 milyon kes di Îranê de di bin hêla hejariyê de dijîn, lê Li gor lêkolîn û pêdeçûnên hindek şarezayên hêla hejariyê û herweha pêvanên cîhanî di warê hêla hejariyê de, ku pêk tên ji pênc xalên "rewşa saxlemî, perwerde, xwedî kar bûn, xwedîşiyansazî û xurekê", tê texmîn kirin ku hijmara kesên ku li Îranê di bin hêla hejariyê de dijîn bigîje 20 milyon kesî.

Derheq hêla hejariya reha û motleq, hindek berpirsyarên hikumeta Îranê weke Wezîrê Karûbarên Civakî, pênaseya nû ya NY di warê hêla reha ya hejariyê de, ku di rojê de dahata xelkê Îranê, kêmtir ji 2 dolarî ye li berçav nagire û dibêjin ku, tu kes li Îranê de, di bin hêla hejarî ya reha de najî û dahata wan kêmtir ji 1 dolarî nîne.

Seba ew rewşa aloz ya abûrî di Îranê de, Bêhdaşta Cîhanî di rapora xwe de eşkere kiriye ku zêdetir ji 12 milyon kes di Îranê de ji destê xwarina xirap de dinalin û ew kesên ku di bin hêla hejariyê de ne, nikarin xwarina xwe ya rojê dabîn bikin û herweha dane zanîn ku berbilaw bûna hejariyek bi vî awayî di îranê de cihê nîgeranî û metirsiyê ye.

Abûriya rejîma Îranê di bin bandora gelek arîşe û gefên micid deya ku ew jî vedigere ser lewaz bûna sîstema siyasî û birêveberiya nedirust a hikumetê û herweha xirab bikaranîna samanên netewî ji aliyê deshilatdarên Tehranê di heyamê 30 sal hukimraniya xwe de, jiber ku li cihê wê ku bûdca memleketê xwe ji bo asayiş, avedanî û xweşkirina rewşa abûriya welat û xelkê xwe xerc bikin, di gelek rêyan ve hat xerc kirin, bo mînak weke serf kirina beşeke zaf ji bûdceya Îranê di heyamê 8 sal şerê Îran û Îraqê de, hewldan bo bidest ve anîna çekên navekî bi şêwaza neyasayî û binpêkirina yasayên navnetewî di warê çekên komelkuj de ku di encam de bûye sebebê vê ku civata cîhanî bi awayê tund Îranê bixe ber dorpêçên xwe, xirap bikaranîna deshilatê ji aliyê karbidest û taqim û girûpên nava deshilatdariya Îranê û rakêşana bûdceya welat û xelkê Îranê ji bo hisabên xwe û malbatên xwe û sermaye gozarî û danana pirojeyên taybetî di navxwe û derveyî welat de, piştevaniya malî bi hemû awayekî ji taqim û girûpên terorîstî li cîhanê de, weke hizbulla û Hemas û gellek bûdceyên din ku bi awayên ne şerî ji xelkê xwe distîne û bo qahîmkirina pêpikên deshilata xwe û ajawegêrî di dinya û navçê de serf dike.

Eva di demekî de ye ku welatê Îranê xwediyê gellek çavkaniyên xwezayî weke petrol û gaz û gelek çavkaniyên din ên bin erdî ye, lê mixabin di warê abûrî û hejariyê de gelek ji Îranê bihêztir in.

Ev şêwaza deshilatdarî û kiryarên Komara Îslamî bûye sebeb ku Pileya Îranê di warê abûrî de di cîhanê de li rîza serveyî sedê cih bigre, û herweha di warê ewlehiya abûrî de, heya pileya 75'ê here û tewerom û giranî bi qasekê di îranê de jêhel çûye, ku hêdî hêdî xelk jiyana xwe di peyda kirina nanê rojê de dibîne.

# Valintayn di Îranê de

***Di Îranê de, pêkanîna cejn û şadî bi awaya şexsî jî bê metirsî nine û gellek caran hêzên besîc û leşkerî ên rejîmê êrîş birine ser wan merasîman, û gellek ji ciwanan destbiser kirine.***

Rejîma Îranê li dijî hemû sembolên çandî ên Rojavayî ye û bi her awayekî li hember wan sembolan de disekine, lê di çend salên derbasbûyî de, roja Valintaynê (roja Evînê) di nav ciwanên Îranî de, weke cejnek tê pîrozkirin.

Reng e yek ji sedemên berdewamî û berfirehbûna vê rê û resmê hebûna nifûsek zaf ya ciwan di Îranê de be. Temenê %60 ji heşîmeta Îranê jêr 30 salî ye û nêzîk bi 1.3 ji heşîmeta Îranê navbera 15 heya 30 salî ne.

Rewşa Îranê bi awayekê ye ku îmkana vê yekê a wan nine keç û kur bikarin pêwendiyek evîndarî a azad pêk bînin, di vê rewşê de roja Valintaynê ji bo wan dibe hêcet û derfetek û herweha beşek ji kasibkar û bazirganên Îranî jî ji vê derfetê qazancekê baş dikin.

Nûçegihaniya Firansayê ji zarê çend dukandarên Tehranê dibêje di vê rojê de alavên weke kartpistal, gul, şokolat, golav û bûkên zarokan pir zaf tên firotin, herweha beşek ji restoranan jî di vê rojê de qazancek baş dikin.

Êlmîra, keçek 24 salî a Tehranî dibêje gelek ji wan kesên ku vê rojê pîroz dikin di qata navêncî yan jî di rewşeke baş a aboriyê de ne. Ew dibêje salên berê ev roj girîngiyek taybetî ji min re hebû, lê rastî ev e ku heya hestek rastîna evîndarî di navbera keç û kur tunebe, ev roj wateya xwe ji dest dide.

Kesên mesebî û sunetî di Îranê de li ser vê baweriyê ne ku berfirehbûna asta nifûza çandên Rojavayî bûye sedema pirsên civakî weke telaqê.

Herweha nasiyonalîstên Îranî hez dikin ku roja Mihrigan ku di destpêka payîzê de ye, weke roja evîndariyê di Îranê de bê nasîn.

Seba, keçek 18 salî ji bajarê Meşedê dibêje: Pîrozkirina roja Velantaynê, ji min re wateya pêrewî yan pesendkirina çanda Rojavayiyê nade, belkî ev tişt ku bo min girîng e hebûna hêcetek bo şadî û cejn e.

Wê dibêje gelek ji ciwanên Îranê hez dikin ku di vê rojê de bi awayekî şexsî ji xwe re cejn û şahî pêk bînin, lê meimûrên polîs hertim bo wan pirsgirêk çê dikin.

Di Îranê de, pêkanîna cejn û şadî bi awaya şexsî jî bê metirsî nine û gellek caran hêzên beîc û leşkerî ên rejîmê êrîş birine ser wan merasiman, û gellek ji ciwanan destbiser kirine.

Meysem ku ciwanek 30 salî ye dibêje ez û jina xwe di vê rojê de diçine bo geriyanê û bo derbaskirina demek xweş em derdekevine derê. Navbirî herweha bas ji rewşa xirab a aborî a welatê dike û dibêje hin car hewce ye ku bo revîn ji fikr û nîgeraniya xwe, em sergermiyên wusa peyda bikin.

**Çavkanî: Radiofarda**



*Ehmed Şabazî:*

## *Di rojekê de me sê pêşmergan zewac kir û demekê me dawet û dîlan kir, her wê şevê êrîşek hat ser me û şerr çêbû, me bûk bicih hêlan û em daketin şerr, tevî hêzên dujmin, mixabin me di wî şerrî de jî çend şehîd dan.*

Hevpeyvîn: Kewê zer


Ehmed Şabazî

### *Ehmed Şabazî sala 1958'an li gundê Zerrîmeya Wermezyar ya ser bi bajarê Dîwandere ji dayîk bûye û heyamê 30 salan e ku pêşmergeyê PDK Îranê ye û niha jî li ser xebatê berdewam e.*

Ehmed Şabazî li ser kar û xebata xwe wuha ji bo duheftînameya Agirî re peyvî:

Temenê min 3 sal bû ku dayîk û bavên min çûne ser dilovaniya xwe û em du bira bûn, birayê min yê din jî ji min biçûktir bû û hêj şîr dixwar, bi vê rewşê piştî jidestdana dayîk û bavan, dapîra me ya dayîkê em birin bal xwe û em xwedî kirin, heya temenê me gihîşt nûçiwaniyê, me bixwe dest bi kar û kasibiyê kir, hem li gundê xwe û hem jî li bajarên din em mijûlî kar bûn ji bo dabîn kirina bijîva jiyana xwe.

Temenê min yê ciwaniyê hevdem bû tev şoreşa gelên Îranê û rûxana rejîma Paşayetîyê, di wan şoreş û xwenîşandanan de em weke ciwan pirr kunckoltir bûn ku em ji halê xwe tiştekê bizanin. Di rastî de min PDK Îranê nas nedikir, lê piştî şoreşa sala 1979'an, pêşmergeyên PDK Îranê hatin devera me û di gundên derdora bajarê Dîwandere de cihgîr bûn.

Sala 1381'an ez û biarayê xwe beşdarî civînekê bûn ku pêşmergeyên PDK Îranê di mizgeftekê de bo xelkê li dar xistibûn, me li wir PDK Îranê nas kir û gotinên wan kardên partiyê ketin nava dilê me de, eva bû ku ez û birayê xwe tevlî refên pêşmergeyên PDK Îranê bûn. Heya 3 salan em derdora bajarê Dîwandere de man û me kar û xebata Partiya Demokrat dikir, û em di wan salan de çendîn car tevî hêzên rejîma Komara Îslamî ku teze bi desthilat gihîştibûn tûşî pevçûnê bûn. Minxabin sala 1984'an de birayê min di pevçûnekê de şehîd bû. Lê jidestçûna birayê min îmana min lawaz nekir, belkî ji bo bidestxistina hêvî û armancên birayê xwe û hemû şehîdên din em bi îmantir ketin qada xebatê.

Di wan heyaman de bû ku xu şkeke min di werza zivistanê de ku pêtirî metroyekê berf ketibû erdê, hat bo dîtina min, ji aliyekê birayê min şehîd bibû û wê jî dixwast ku min bibîne, lê di rê de di nava berfê de mabûn, zarokek sava jî di hembêzê de bûye, lewma kesên di gel de, gotinê ku berfek zaf di rê de ye tu nikarî bi zarokê xwe ve, vê riyê bibrrî, wê jî zarokê xwe avêtibû ser berfê û ketibû rê û hat ez dîtim, kesek ku bi wê re bû, ew zarok hilgirtibû û vegerandibû mal.

Min bi dîtina wan hemû tirajîdiyan û piştre ên zêdetir jî dev ji xebata xwe berneda. Min îman bi kar û xebata xwe û partiya xwe hebû, û herweha bawera min ew bû ku jiyan jî tevî xebatê dikare bimeşe, lewma min têkilî bi keçmamek xwe re kir û ez bi wê re zewicîm di yek ji gundên derdorên wê deverê de. Di rojekê de me sê pêşmergan zewac kir û demekê me dawet û dîlan kir, her wê şevê êrîşek hat ser me û şerr çêbû, me bûk bicih hêlan û em daketin şerr, tevî hêzên dujmin, mixabin me di wî şerrî de jî çend şehîd dan.

Piştî 5 salan bi vî awayî me xebata xwe meşand û rewş hat guherîn û em neçar bûn ku rû bikne çiyayan. Bi neçarî min hevjîna xwe şand malê û heya 3 salan ku em vegeriyan binkên partiyê di çiayayan de. Piştre min hevjîna xwe anî û bêyî ku guh bidim jiyana xwe a şexsî, min ji tu erkek partiyê kêmasî nekir. Li wir pêve ez êdî neçûm bo navxweya welat û di qada şerrê çekdarî de nemam, ez ji binkeyên PDK Îranê de cihgîr bûm.

Ez 3 salan pêşmergeyê girtîgeha PDKÎ bûm û 2 salan jî ez pêşmergeyê fêrgeyê "Navenda Hînkirina Pêşmergan" bûm, û piştî wê demê heya niha eva 20 sal e ku ez di organa Malî û Xedematî a PDK Îranê de kar dikim, lê min jêve ye ew 20 roj in, tucar ji karê partiyê nevestiyame, û heya nefesek min jî bihê, ezê xizmetê ji wê partiyê re bikim. Roja ku ez hatime refên PDK Îranê, ez dirust hatime û serkevtinên wê partiyê û pêşeroj jî dê eyan bike ku min riyek rast hilbijartiye.

### *Tahir Pîremeranî di sala 1958'an li gundê Pîremerana devera Gewrika ser bi bajarê Seqizê jidayîk bûye û heyamê 30 salan e ku pêşmergeyê PDK Îranê ye û niha jî li ser xebatê berdewam e.*

Navbirî bi vî awayî qala 30 sal xebata xwe di PDK Îranê de kir:

ez di temenê nûciwaniyê de weke her herêmên din ên Kurdistanê mijûlî karê pezdarî û werzêriyê bûm û me jiyanek bi qasekê baş hebû. Ez zewicîm û ez çûme bajarê Banê û li wir cihgîr bûm, wê demê bû ku şoreşa gelên Îranê a 1379'an destpê kir û partiya demokrat jî xebata xwe berfirehtir kir û hêzên pêşmerge daxwaza hevkariyê ji xelkê dikirin.

Min jî têkilî bi pêşmergan re kir û ez heyamê du salan li mala xwe de endamê PDK Îranê bûm û piştre sala 1981'an ez bi awayek fermî bûm pêşmerge, lê min jin û zarok tev xwe nebirin, heya 2 saln û ez bi zigurtî di nava hêzên pêşmergan de li devera Seqizê mijûlî xebatê bûm, heya êrîşên hêzên rejîma îslamî a Îranê hatin ser me û bi neçarî em bo sînorên Îraqê vekişiyan û li "Hanegermile" gundek bû ku nêzîkî 500 mal dibû ku hikûmetê topbaran kiribû û xelkê jî gund berdabûn û em li wir cihgîr bûn û min jin û zarokên xwe jî anîn cem xwe.

Lê em bo navxwe a welat diçûn û li devera Seqizê de me kar û xebat dikir, di dirêjiya wan kar û xebata me de, em tûşî çend pevçûnên çekdarî tev hêzên rejîmêî bûn û tevî ku me derbên giran li dujmin didan, lê hejmarek pêşmergên me jî di wan çend pevçûnan de şehîd bûn, eva yekem ezmûna min ji bo soza wefadarî bi wan şehîdan bû ku min riya wan heya niha berdewam kir.



Tahir Pîremeranî

Heya ku êrîşa bo ser Helebceyê hat û em nêzîk 800 kes li derdora Helebce man û heyamê 5 rojan em li jêr topbaranan de man, min jî ku jin û zarok tev min bûn, ji bo min pirr zehmet ketibû, bi her awayekê be bi hinek karên pêwendiyan ji aliyê Deftera Siyasî a PDK Îranê ve em derbasî devera "Seydsadiq" bûn û me xwe gihand defterê. Li wir jî min neqla xwe bo Komîteya Şinoyê wergirt û heyamê 2 salan jî ez li Mamexetîb li Komîteya Şinoyê mam û em diçûn navxwe a welat û em vedigeriyan miqeran.

Piştre ez hatim Melbenda du, û li devera bayincan man û êdî ez bo çelakiyên çekdarî neçûn navxwe a welat, û min bi awayek din di Komîsyûna beşa karûbarên Civakî a PDK Îranê de xebata xwe domand. Piştre em hatin nava bajarên Herêma Kurdistanê de û heya niha ez li Koyê me û di organên cur bi cur ên partiyê de ez kar dikim, ji karê xwe jî mandî nabim û navestim û ji derbasbûya xwe jî poşman ninim. Çimku bi dîtina min, vê partiyê tovek çandiye ku ew tov dê berê xwe bide, wêca niha be yan demek din, negirîng e, girîng ev e ku emê bigîjin armancên xwe.

Ez xweşbîn im ku niha jî hejmarek zaf a ciwanên xwendevan ên Kurd rû dikin şoreşê û ewê doza me bimeşînin, lê axaftina min bo wan ev e ku wê partiyê ji destên me bigrin û biparêzin. Raste ew jêhatî û dersxwende ne, lê ji bo îman û dilpaqijiyê, hewce ye ku em bi wan re bêjin ku di derbasbûyî de, di vê xebatê de dilê me çiqas paqij bû û em bi hevre çiqas rast bûn, lê me xwendevarî nebû, ger ew dilpaqijî û dilsojî tev xwendevanî zanayiya ciwanên îro têkel be, bê guman dê gavên me ber bi armancên me bileztir bikin.

Ji aliyek din jî bi bawera min tu partiyek di cîhanê de mîna PDK Îranê nebûye bo perwerdeya zarokan, ez hertim memnûnê partiya xwe me, ku wê zarokên min kirin mamosta û xwendevan, bêyî ku min tiştek bo wan kiribe. Ez hêvîdar im ku hemû zarokên di partiyê de ne, buhayê wî karê partiyê bizanin ku ya niha PDK Îranê ji zarokên me re dike, dewletek jî ji zarokê xelkê xwe re nake. Bê guman partiyek wuha dê bikare pêşrewê xelkê xwe be.



Şût

# Bajarê Şûtê

***Li herêma Şûtê de gelek asewarên dîrokî û çandî hene ku hin ji wan seba xemsariya karbidestên dewleta Îranê û li piroseya li nav birina asewarên kurdistanê li nav çûne ku ya herî girîng em dikarin îşarê bi awahîya Êmaret a gundê Xûkê bikin ku dikeve 5 kîlomêtrîya bajarê Şûtê.***



Mecîd Cinîkanlû

Şaristana Şûtê li sala 1387'an a Rojî de bûye şaristan. Şût bajarekî ser bi parêzgeha Urmiyê ye û bajarê Şûtê li navenda şaristana Şûtê li çar kîlomêtrîya başûrê çemê Zengemar cih girtîye. Nifûsa bajarê Şûtê 19759 kes e. Ew şaristan ji alîyê bakûr ve tevî Şaristana Makûyê, ji alîyê rojhilat tevî şaristana Pûldeştê, li alîyê başûrê rojava tevî Çaldoranê û li aliyê başûrê rojhilat tevî Qere Ziyaedîn hevsînor e.

Ew bajar xwediyê dîrokekî gelek kevnar û dûr û dirêj e, û akinciyên wê yên yekemîn Ermenî bûne, lê niha çi Ermenî li bajêr jiyanê nakin. Akinciyên wî bajarî li dû netewên kurd û Azeriyan pêk tê ku piranîya bajêr û gundên derdora bajêr kurd in. Kurd û Azeriyên nav bajêr bi salane ku bi awayekî birayane bi hewra dijîn. Li hin çavkanîyên dîrokî de hatiye nivîsandin ku navê wî bajarî "Aşût" bûye û li serdemê Şahê Îranê navê bajar kirin bi Şahabad. Piştî serhildana gelên Îranê li sala 1357'an a Rojî de navê bajar guhertin û kirne Şût. Şût navê qehremanekî Ermenî ye û navê bajêr jî her li navê wî qehremanî hatîye wergirtin.

Şaristana Şûtê, xwediyê du bajaran bi navê Şût û Mergenler û sê dêhêstanan bi navên: Yûla geldî, Qereqûyûn a bakûr û Qereqûyûna başûr e. Bajarê Mergenler xwediyê nêzîkî 4000 kesî ye û li 35 kîlometrîya bajarê Şûtê û li ser rêya teranzîtîya Makû bo Bazirganê cih girtîye.

Li nav bajarê Şûtê seba kêmtirxemiya karbidestên rejîma îranê, ev bajar wek bajarekî bêserûber xûya dike. Li nava bajêr de îmkanatên geştîyarî pir kêm in û park û cihên ku xelk bixwaze ji bo çend demjimêran li nava bajêr çaxekî xweş bi ser bibin gelek kêm in. Piraniya îmkanatên madî yên bajêr ji alîyê karbidestên rejîmê ji bo kar û barên olî û bitaybetî bo mebestên rejîma Îranê ji bo Şîeyan bi kar diçe. Kurdên Şûtê ji wan îmkanatên dewletî tu parek nînin û heta Mizgevta Kurdan a herêmê bi pere û îmkanatên xelkê kurd hatîye çêkirin û dewletê çi alîkarîyek bi wî xelkî nekirîye. Sîyaseta înkara Kurdan li vê herêmê jî wek hemû herêmên din yên Îranê birêve diçe û Kurd bi hemû awayî ji alîyê deshilata Komara Îslamîya îranê ve tên çewsandin.

Kurdên bajarê herêma Şûtê hemû bi Kûrmanciya jorîn dipeyvin. Gelê Kurd yê herêmê zêdetir bi karê Cotkarî û ajeldarîyê mijûl in. Kurdên wê herêmê piranî ser bi eşîrên Celalî ne û gelekî welat parêz in.


Kurdên li herêma Şûtê bi awayekî herî tund ji aliyê karbidestên rejîma Îranê vê tên tepeser kirin û îzna tu çalakîyekî civakî û çandî bi kurdan nayê dayîn. Her çalakiyekî Kurdan bi dijberî tevî Xudê tê zanîn û encama vê bi darvekirina xortên kurd e.

Kurdên herêma Şûtê bi welatperwerîyê li nava gelê herêmê de hatine naskirin. Li wê herêmê li serdemê serhildana Agiriyê gelek xweşmêrên Kurd tevlî serhildana kurdan bûn û alîkarî bi vê bizava rizgarîxwazîya Netewa Kurd kirin. Her wisa Kurdên herêma Şûtê li serhildana Simkoyê Şikak de jî gelek qehremantî kirin û zaf hewil dan ku Simko û serdarê Makûyê ku regekî wî kurd bû, bi hevra hevpêymanîyekê çêkin, lê mixabin seba hind arîşeyan nekarîn wî karî bikin.

Li herêma Şûtê de gelek asewarên dîrokî û çandî hene ku hin ji wan seba xemsariya karbidestên dewleta Îranê û li piroseya li nav birina asewarên kurdistanê li nav çûne ku ya herî girîng em dikarin îşarê bi awahîya Êmaret a gundê Xûkê bikin ku dikeve 5 kîlomêtrîya bajarê Şûtê.

Her wisa li herêma Şûtê kûpikek bi navê Xelkê awa heye kû dîroka vê bo berê zayînê wedigere. Herêma Şûtê seba hilkevta cûxrafîya xwe gelekî xweş û cihê seyran û gerîyana xelkê îranê ye.

Li herêmê çend kanîyên ava gerim hene ku li ser tepikekê li dilê erdê de têne derê û xelk ji bo dermana nesaxîyên pêst mifahê ji wan kaniyan werdigire. Her wisa Sûla çêkirî ji berî a wî bajarî û Menba avê ya wî bajarî yek ji cihên geşt û gûzarî yên bajarê Şûtê ne. Li herêmê de rojnameyek bi navê "Awayê Makû" heye ku xwediyê vê xelkê bajarê Şûtê ye û li ser rûdaw û pêşhatên herêmê bi zimanê Farsî bilav dibe. Rojnameya han eger çi nikare bi awayekî berfireh weşanê bike, lê bo xelkê herêmê ji alîyê rewşenbîrî mifah hebûye.



www.arsivakurd.org

*Alêks Sekkerterê Saziya Efûya Navnetewî a Kanadayê li pêwedî li gel hukmê îdama Seîd Melikpûr, penaberê Kanadayê ragihand:*

***"Îran bûye tirumbêla kuştarê, û her roj sê kes tên îdamkirin".***

***Seîd Melikpûr bi tometa avakirina sîstema portogirafî li Îranê de destbiser û bi îdamê hatiye mehkûmkirin.***


Kawe Behramî

**Li vê derheqê birêz Kawe Behramî, endamê Deftera Siyasî a PDKÎ ew gotin weha şirove kir**:

Eva yekem car nine ku li dadgehên Komara Îslamî de hukmê îdamê biser kesên han de nehê sepandin, çunku rejîmê her di despêka hatine ser kara xwe de tu yasa û rêsayên navnetewî berçav negirtine û gelek Îraniyên akinciyên welatên din bi tometên nerewa hukim dane yan îdam kirina, weke




Zara Kazimî û ... Eva jî dijî hemû yasa û rêsayên navnetewî ên pêwendîdar bi mafên mirovan e.

Rejîma Îranê serbarê vê ku tu giranî û nirxek di civata navnetewî de jêre nemaye, kesatiya takên Îranê jî xistiye bin pirsyarê û rûçikê wan xerab dike.

Lewma jordeçûna serjimêriya îdamê di çend salên derbasbûyî de cihê nîgeraniyê ye û serbarê hemû hewl û xebatên dinyaya dinyaya îro bona ragirtina hukmên îdamê, lê rejîm berawajî helvêsta cîhanî her berdewam e û pêka serjimêriya lêbordeyî navnetewî, tenê di 18 rojên despêka sala 2012'an de 53 kes di Îranê de hatine îdam kirin.

Di rastî de Rejîmek ku girîngî nade maf û daxwaziyên gelên Îranê û wan bi awayên cur bi cur serkut dike, netenê mafê mirov berçav nagire, belkî jiyana kesên ku di rasteya bîr û hizra hişk û bertenge wan nebe, li metirsî de ye.

***************

*Ehmed Tewekolî nûnerê parlementoya Îranê :*



***" Şêweya filterkirina malperan, bi bêy vê ku pêştir bîr ji bedîlekê hatibe kirin, ew ji di demekê de piraniya nêzîk bi tewaw ya xelkê Îranê mifahê ji wan malperan werdigrin, û bê bêy wê ku berpirsyaran di vî warî de karîbin xelkê razî bikin, dikare rexneya texa xwendewar ku çendîn milyon kes in, li pey xwe re hebe. Ew şêweya filtêrkirnê xelk nerehet kirin e, û dikare bo nizamê giran tewaw be".***

**Birêz Kawe Behramî gotina Tewekulî wiha şirove kir:**
Daxistina hêla Înternêtê û sansorkirina medyaya di Komara Îslamî de her berdewam bûye û tiştek nû nine. Ji riya Wezareta "Êrşad" ve li hemû metodên sansorê û berbestên medyayî, bikar anîn û eve ku bûye cihê rexneya

Ku bixwe yek ji avakerên sansorê li zanîngehan Ehmed Tewekulî û bala wî rakişandiye, şêwaz û taktîka sansora înternêtî ye ku bi dilê wî nine û dibêje diviya bi awayek bibûya ku tu kesê/î hest nekiriba ku ji aliyê Komara Îslamî ve hatiye filtêr kirin!!!


Pirsgirêk li vê de ye ku Muhemed Hesen Şanesaz Zade, berpirsyarê beşa înternêta Hamil di Îranê de, sedema vê ku xelk nikarin maylên xwe bilez vekin ev e ku bikarhêner divê filtêrîngên xwe rakin û paşan bikarin mifahê ji înternêtê werbigirin.


Li gor serjimêriyên hikûmetî, înternête pitir ji 30 milyon bikarhêneran di îrenê de hatiye qutkirin û sansorê wê hêj berdevam bimîne, çunkî rejîm ji hemû aliyan ve di bin givaşê deye û dixwaze bi vê yekê givaşan li ser xwe kê bike, lê di encam de dûkel û kadûya van terze sansor û berbendan, wê biçe çavên rejîmê û xelkê Îranê dê mikanîzmên bêtir ji bo berbirûbûn bi Komara Îslamî re bibînin.

***************

*Ehmedî nijad di roja 22'ê Rêbendanê de:*

***"Her roj hûn biryarnameyan dijî me derdikin, bizanin ku heke hûn bixwazin bi zimanê zorê bi me re bipeyvin xelkê Neteweya Îranê -qet li hemberî we de teslîm nabe. Herweha Neteweya Îranê karek herî giring ku şiya bike şikandina botek nû ya modern bû. Îstikbar û koledaran bona vê ku bi ser cîhanê de zal bin, botek bi navê rejîma Sehyonîstî ava kirin û ruha wê botê çîrokek bi navê holokastê bû. Lê neteweya Îranê bi hişmendî ew bot şikand û rê ji bo azadiya netewên Rojavayî xweş kir".***




Luqman Mêhfer

**Birêz Luqman Mêhrfer, endamê Komîteya Nawendî yê PDKÎ wê gotinê wiha şirove dike**: Bi baweriya deshilatdarên ku heya niha biser Îranê de hikûmet kirine peyva Netewe bi vî awayî tê pênese kirin, bi hemû netewe û kêmaniyên ku pêkhata Îranê pêk tînin dibêjin netewa Îranê. Bi wateyek din jî neteweyek ku xwedî dewlet nebe weke netewe nehesibandin. Lê eve di warê dîrokî û zanistî û hiqûqî ve pênaseyek nediruste, çunkî netewê pênaseya zanistî a xwe heye. Ji aliyeke din ve bikar anîna peyva netewa Îranê bi vê mebestê ye ku bi welatên rojeva û cîhanê bigiştî bêjin ku hûn bi tenê digel karbidestên Komara Îslamî re berbirû nabin, belkî hûn digel hemû xelkê Îranê ber birû ne. Eva jî di rastî de dirust nîne, çunkî her deshilatek ku bikeve ber kerb û kîna xelkê xwe,vê wateyê digehîne ku şeriyeta xwe ji dest daye mîna ku Îranê ji dest daye. Rejîma Îranê bi navê xelkê Îranê dijberiya Amerîka û Îsraîlê dike, lê xelkê Îranê xelkek xwedî şaristeniyet in û daxwaza bihevre jiyanê bi awayek aştiyane di gel gelên cîhanê dikin, beravajî nêrîna deshilatdarên Komara Îslamî ku rijdin liser pêkanîna fezaya şer û alozî afirandin.

*Xamineyî li hevdîtina bi Îsmaîl Henye re:*

***" Me li berxwedaniya we û gellek ji birayên we yên berxwedanvan de tu şik û guman tune. Û xelkê jî çavnihêriyek ji bilî vê yekê ji berxwederên Felestînê tuneye".***

***Wî herweha îşare bi qedera Yasir Erefat kir ku di destpêkê de ew hezkiriyê xelkê bû, lê piştre ku ji rêrewa muqawimetê de derket, di nav netewên herêmê de êdî nehate hezkirin. Lewma ragihand ku: " tenê berxwedanî û rawestan dikare xelkê ber bi aliyê xwe ve bikêşe, û divêt hûn vê yekê ji bîr nekin ku pirsa Felesîtnê, pirsek Îslamî û pirsa me ye jî, û Îran wê hertim li rex xelkê Felestînê be"!!!***



**Li ser vê yekê jî birêz Mêhrfer da zanîn** ku Mebesta Xamineyi zelal û bi awayeke eşkere ji Îsmaîl Heniye re dibêje ku em ji Hemasê re bişik in. Em nîgeranin ku di rewşeke weha ku em têde ne Hemas helwesta xwe bi nisbet me biguherîne. me gelek sermayegozarî li ser we(Hemas) kiriye, valayî û şeqar dinav we de çê bibe, hevkêşe jî diguherin û zehmetên me xesarî dibin. Lewma Heniyê han dide ku dest ji helwesta xwe ya tundrewane ku şer û nelihevhatine bernede.

Çunkî Komara Îslamî bi xwe rejîmek kirîz afrîne û mana xwe di fitne, alozî û şer de dibîne. Êrîşa bo ser Erefat jî bona wê ye ku dixwest pirsa Felestînê ji riya diyalog û aştiyê çareser bike û civata cîhanî jî pêşwazî ji helwesta wî dikirin.

Ji hêleke din ve, Xamineyî rexne ji Hemasê digre ku ji rejîma Beşar Esed bi awayê hewce xwedî derneketine. Paşan jî pirsa Felestînê bi pirsa Îslam û pirsa xwe dizane, lê 33 salên ku xelkê Felestînê çi xêr û bereketek ji destê rejîmê dîtine, ji bilî têkdan û ajawegêrî nebe. Dîrokê îsbat kiriye ku hekî Felestînî pêngavekê ji çareseriya pirsa xwe û aştiyê nêzîk bikin, Komara Îslamî bi awayên curbicur rêgirî jê kiriye û ji aliyê din jî rondikên tîmsahî jêre dibarîne.

# Agirî


Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com




Urmiyê, Gundê Qasimlû

## Îran di warê jordeçûna amara telaqê di pileya çarim a cîhan de ye




Îran di warê jordeçûna amara telaqê di pileya 4'mîn a cîhanê cih girtiye.

Pêka amarên fermî ên rejîmê, ji sala 1350'an a Rojî heya niha, geşekirina diyardeya telaqê 6.5 beramber zêdetir ji navinciya amara jordeçûna zewicînê bûye.

Di sala borî de, Îran bi hebûna 137 hezar telaq di pileya 4'mîn a cîhanê cih girtiye.

## Salane 51 hezar kg madeyên hişber di Îsfehanê de tê bikaranîn



Hesen Keremî, fermanderê hêzên Întizamî ên Îsfehanê ragihand ku salane 51 hezar û 840 kg madeyên hişber di wê parêzgehê de tên bikaranîn.

Herweha %50 ji girtiyên wê parêzgehê tûşî îtiyadê bûne.

%50 ji gişt muitadên parêzgeha Îsfehanê madeyên hişber ên sunetî weke Tiryak bikar tînin, herweha %30 a wan Şûşe û %20 din jî madeya Hiroyînê bikar tînin.

Bikaranîna madeyên hişber di wê parêzgehê de, salane zêdetir ji 1000 milyard tûmen xisara li aboriya welatê dide. Eva jî li hêlekê de ye ku berpirsiyarên rejîmê û hêzên serkutker ên wê bixwe li belavkirina vê di nav xelkê Îranê de dest hene.

## Civata Giştî a Saziya "NY" birryarnameya li dijî rejîma beşar pesend kir



Civata Giştî a saziya "NY" birryarnameyek li dijî rejîma Beşar Esed bona tepeseriya neraziyan pesend û serbarê mehkûmkirinê, û xwazyarê devberdana Serokkomarê wî welatî ji desthilatê bû.

Birryarnameya han 16'ê Şibata 2012'an, di Civata Giştî a Saziya "NY" li Niyyorkê, ket ber dengdanê û bi 137 dengên Erê û 12 dengên Na, hat pesendkirin.

**Kurdên Sûriyê di refrandoma rejîma Beisa a Sûriyê de beşdarî nakin**

piştî ku rejîma Sûriyê biryar stand ku di meha Şibata îsal de refrandomê bike, Kurdên wî welatî ragihandine ku dê refrandoma han tehrîm bikin. Li gor rapora malpera "Rûdaw" "Ebû Sabîr" Endamê Deftera Siyasî yê Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê ragihandiye, yasaya ku biryar e di vê mehê de bikeve ber dengdanê, bi tu awayekê di berjewendiya gelên Sûriyê de nine û rejîma Beis dixwaze bi wî karî rewatiyê bide desthilat û hikûmeta tepeserkar a xwe.

Navbirî gotiye ku yasaya nû a rejîma Beis, bas ji tu mafekê kêmaniyan weke Kurd, Mesîhî, Ermenî û Çerkes an nekiriye.




www.arsivakurdi.org